Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1303 31-Tebax-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Koma Govendên Efrînê; Armanca me zindîkirina çanda Kurdî ye

Dîlan Mulhim\Qamişlo

**Mamosteyên Komên Govendên Efrîn Ebdê Beskê û Leyla Reşîd diyar kirin ku wan ji tunebûnê hebûn ava kirin û gotin, "Armanca me zindîkirina çanda Kurdî ye."**

Gelê Efrînê yên ku ji 7 salan ve bi darê zorê ji ber dagirkeriya Tirkiyê koçberî herêma Şehbayê bibûn, di 2'ê Kanûna 2024'an de piştî rûxandina rêjîma Bass û serweriya HTŞ'ê li ser Sûriyê, HTŞ'ê berê xwe da herêma Şehbayê. Bi banga Maclisa Gel a Efrîn û Şehbayê û di encama lihevkirinan de korîdor ji bo derketina gelê Efrîn û Şehbayê hate vekirin û gel derbasî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû. Gelê Efrînê di qonaxa duyemîn a koçberiyê de careke din xwe birêxistin kir û jiyaneke nû destpêkir û di vê çarçoveyê de xebatên xwe dan meşandin, yek ji wan xebatan jî xebatên hunerî û çandî ye. Bi taybet ji bo gelê Efrînê parastina govenda Efrînî yek ji hîmên bingehîn a parastina çanda Efrînê ye. Komên govendê yên Efrînî li Tepqayê xwe birêxistin kirine. Di derbarê mijarê de, Mamosteyên Komên Govendên Efrînê Ebdê Beskê û Leyla Reşîd ji Rojnameya me re axivîn.

**Kar û xebata Komên Govendên Efrînê**


Ebdê Beskê di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Li Efrînê kar û xebatên Koma Govendê ya Kevneşopiyê dihate meşandin. Dema êrişî li ser Efrînê hatin kirin, di encama êrîşan de em koçberî Şehbayê bûn. Herwiha ji ber rewşa koçberiyê Koma Govendê ya Kevneşopiyan ji hev parçebû û her hevalekî me bi cihekî ve çû. Di heman demê de li Şehbayê me hêdî hêdî hevalên xwe komkirin û li Şehbayê me dest bi karê xwe kir. Lewma dema ku êriş li ser Şehbayê jî hatin kirin di encamê de, em koçberî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn; careke din her hevalekî me çû bi cihekî de. Me gelek astengî û zehmetî di karê xwe de kişandin, lê ruxmî van astengiyan me karê xwe berdewam kir"

**'Ji tunebûnê me hebûn avakir'**

Beskê anî ziman ku piştî ew koçberî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn wan navê koma Govenda Efrînê kir "Vegera Efrînê" û wiha pê de çû: "Me ji tunebûnê hebûn avakir, li ser vî bingehî em bi kêfxweşî karê xwe berdewam dikin. Herwiha hevalên me sozadan ku wê bê navber karê xwe berdewam bikin. Koma govendên Efrînê herin kîjan cihî xwe birêxistin dikin û xwedî li çanda xwe derdikevin. Di heman demê de, em nahêlin ku çanda me were windakirin û armanca me zindîkirina çandê ye. Em bi hêvîne ku vegerin Efrînê, kar û xebatên koma xwe pêşbêxin û berfirehtir bikin ."

**'Hejmara endamên koma Govendê 11 kes in'**

Mamosteyê Govendên Efrînê Ebdê


Ebdê Beskê


Leyla Reşîd

Beskê da zanîn ku hejimara endamên koma govendê 11 kesin û wiha bi dawî kir: "Em niha endaman perwerde dikin, herwiha endamên me di heftiyê de sê rojan perwerdeyê dibînin. Heta astekê baş perwerde tê dayîn û em dixwazin hejmara endaman zêde bikin û em endaman li ser gelek rengên govendan perwerde dikin, mîna govenda mewlanî, zenûbiya, eyhemo û pepûkê û hwd…in."

**'Aramnca me vejînkirina çandê ye'**

Leyla Reşîd di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Dema ku mirov çanda xwe nasneke, helbet dîroka xwe jî nasnake. Herwiha dîrok, çand û nasmame yekin û mirov bi riya vê yekê tê naskirin. Dema ku em ji Efrînê koçberî Şehbayê bûn, me gelek astngî di jiyana xwe de dîtin, lê ruxmî van astengiyan me çanda xwe ji nû ve vejîn kir. Lewma dema ku em ji Şehbayê koçber bûn me berê xwe de bajarê Tebqayê û niha em kar û xebatên xwe di asteke baş de didin meşandin. Em çanda xwe zindî dikin û du komên me yên xweser jî hene; koma me ya bi navê Zeriya Zêrîn û ya din jî bi navê Dengbêja Kabûnî ye."

**'Pêwîst e her kes xwedî li çanda xwe derkeve'**

Mamosteya Koma Govendên Efrînê Leyla Reşîd axaftina xwe wiha bi dawî kir:" Navên govendên me jî wiha ne: Govenda Edûlê, Xatûnê û hwd… Herwiha pêwîst e her kes xwedî li Çanda xwe derkeve, ji ber dema ku mirov ji çanda xwe dûr bikeve û neparêze, wê demê nasname û dîroka xwe jî windadike."

**Koma Çiyayê Hewarê ya Efrînê**

Koma govendê ya Çiyayê Hewarê ya zarokan li bajarê Tebqayê ye û hejmara zarokên komê jî 26 in; herwiha ev du mehên ku komê dest bi karê xwe kirî ye, û hewildanên wan ew e, ku astengiyên li pêşiya wan dibin asteng derbas bikin.

## Gotina Dawî



### Ew ê çi xêr ji desthilatê bê?

Mihemed Seydi

Piştî ku Rêjîma Baas hilweşiya û Beşar El- Esed reviya, HTŞ wekî desthilat hat sepandin. Ebû Mohamed El-Colanî kirin Ehmed El-Şeri û ew wekî serok dan pêş û wiha çîroka bi êş ya xelkê Sûriyê careke din nivîsîn. Vê desthilata nû jî yek nekir didû û yekser li Beravê dest bi kuştina Elewiyan kir. Hêzên navdewletî yên ku li peyî vê desthilata li Şamê ne, dema dîtin Ehmed El-Şeri kontrolê wenda dike, ew bi fermandarê QSD'ê Mezlûm Ebdî re civandin û peymana 10'ê Adarê îmze kirin. Bi vê yekê jî xwestin rewabûnekê bidin desthilata li Şamê û QSD'ê jî bi niyeta ku komkujî bi dawî bibin beşdar bû. Lê pişt çend rojan ji imzekirina vê peymanê, reşnivîsa destûrî derket ku serokê desthilata veguhêz jî ew îmze kir û tê de ji bilî tunderewiyê hemû pêkhate, ol û rengan red dike. Hinek deng li ser vê reşnivîsa destûrî ku ji ya şofîniya Baas xirabtir e derketin, lê tişt neguherî. Di heman wextê de li ser dezgehên çapemeniyê yên Erebî bi taybet propagandaya ku hîn desthilat nû ye û dem jêre pêwîste da hin tiştan baştir bike dihat kirin. Digotin divê QSD'ê û pêkhate pêre li hev bikin û destekê bidinê, lê komkujî bi destê komên selefî û islamîst dewam kirin. Li ser zextên hin rêxistinên mirovî û raporên dezgehên çapemeniyê yên weke Reuters, desthilatê got ku ew ê komîteyekê ava bike da kesên destê wan di kuştina Elewiyan de heye diyar bike û wan ceza bike. Lê vê komîteyê çi kir? Got ku ev kes bi destê bermahiyên Rêjîma berê hatine kuştin. Hîn encamên lêkolîna vê komîteyê derneketibûn, li Siwêdayê jî komkujî pêk hatin û di nava qada navdewletî de deng veda. Vê carê jî ji bo Ehmed El-Şeri biparêzin, xwestin QSD'ê destwerdan bike, lê QSD'ê qebûl nekir û li dijî komkujiya helwest nîşan da.

Lewra vê carê dîsa dewleta Tirk ket dewrê û niha jî wekî berê dibêje bila Reqa û Dêra Zorê radestî Şamê werin kirin ji ber ew herêm yên Erebî ne, lê ji bîr kiriye ku wê axa Sûriyê û bajarên Kurd û Ereban dagirkiriye. Ji ber dibîne bakur û Rojhilatê Sûriyê xwedî projeya Neteweya Demokratîke ku hemû pêkhate beşek ji wê ne, wiha difikire ew ê parçebûnê bike nava wê da bihêle MSD'e û QSD di danûstandinan de lewaz be. Lê ka wê Şam çi bide kê û çi di destê wê de heye?

Komîteya lêkolîna komkujiyan ava kir ku li ser endamên wê bi xwe lêkolîn divê were kirin. Qaşo reşnivîsa Destûrê ragihandin ku ji ya Baas xerabtir bû û di nava xwe de fikrên DAIŞ dihewîne. Hikumetek ava kir ku hemû endamên wê Gendelîkar û fasidin. Gotin wê hilbijartinên Meclisa Gel a Sûriyê lidarbixin, lê serok dikare ji nîvî zêdetir endaman bi xwe hilbijêre. Herî dawî jî gotin ku komîteya dadweriya veguhêz ava kirine ku ji endamên wan ew bûn ku bang dikirin bila Tirk werin Kobanê û Sûriyê dagir bikin. Hîjar ew ê çi xêr ji desthilateke wiha bê?

### Sudoku:Pirs 55

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 8 | 5 | | | | | 6 | |
| | | 3 | | | | | | 4 |
| 1 | | | 8 | | | 3 | 9 | |
| 9 | | | | | 7 | 5 | 1 | |
| | | | 5 | 9 | 8 | | | |
| | 7 | 6 | 1 | | | | | 8 |
| | 3 | 4 | | | 2 | | | 1 |
| 6 | | | | | | 8 | | |
| | 2 | | | | | 4 | 7 | 9 |

### Sudoku: Bersiv 54

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 1 | 4 | 9 | 2 | 7 | 6 | 3 | 8 |
| 6 | 2 | 7 | 3 | 8 | 5 | 1 | 4 | 9 |
| 8 | 3 | 9 | 4 | 1 | 6 | 5 | 2 | 7 |
| 2 | 6 | 1 | 7 | 5 | 8 | 4 | 9 | 3 |
| 7 | 4 | 8 | 6 | 9 | 3 | 2 | 5 | 1 |
| 3 | 9 | 5 | 1 | 4 | 2 | 7 | 8 | 6 |
| 9 | 7 | 2 | 8 | 6 | 4 | 3 | 1 | 5 |
| 4 | 8 | 6 | 5 | 3 | 1 | 9 | 7 | 2 |
| 1 | 5 | 3 | 2 | 7 | 9 | 8 | 6 | 4 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER NEÇARÎ Û MECBÛRIYETÊ**

**Bivênevê ye:**
- Mecbûrî ye; ne karê bidil e; ne li ser xwestinê ye.

**Cer bê çembil mişar bê kermil nabe:**
- Ji bo tiştên pêwîst tê gotin.

**Di gund de mêr neman, ji dîk re dibêjin Evdirehman:**
- Ji neçarî ew kirine berpirs; ji neçarî ew dane pêşiya xwe.

**Hingivfiroş tiliya xwe dialîse:**
- Hin tişt ji neçarî tên kirin.

**Ji neçarî mirov goştê kewê xwe jî dixwe:**
- Weke din ti çareyên min tinebûn. (Dema yek tiştekî xwe yê hêja xirab dike, yan tiştekî pê dike, yan tiştekî bê daxwaziya xwe qebûl dike û hin rexne dikin, hingê dibêje. Kewgîr zûbizû gotşê kewê xwe naxwin)

**Ji tineyiya mêran navê dîk kirin Evdirehman:**
- Ji neçarî ew kirine berpirs; ji neçarî ew dane pêşiya xwe.

**Kalê bênefsî, pîra bêkesî her duyan li hev pirsî:**
- Kesên muhtac, kesên rewşa wan weke hev hevaltiya hev dikin.

**Kon bê kozî nabe:**
- Hin tişt hene bivênevê ne. (Di binê kon de ciyê agir lê dikin jê re dibêjin kozî. Weke din ji sergînan jî bi awayê kûzan çêdikin û agir tê de dikin. Ev di binê konan de jî dibe, li derve jî. Ji wan re jî tê gotin kozî)

**Tu bibî kelem:**
- Tu bimirî tuyê bikî; tu mecbûr î.


**Tu çiqas bikî çîza çîza tuyê bidî heqê gûza:**
- Tu çi dikî bike, tuyê wî karî bikî. (yan jî tuyê wê tiştê bidî)

**Xwe bidî tîzan nedî tîzan, tuyê bidî heqê gûzan:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Ji bo pêkanîna demokrasiyê têkoşîneke mezin tê xwestin'

Hevserokê PYD'ê Xerîb Hiso diyar kir ku di Kongreya Hevpeymaniya Civaka Demokrat ya Cîhana Erebî de tecrûbeya demokratîk li Kurdistan û herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke nimûneyeke ji bo parastina Sûriyê û çareseriya aloziyên herêmê derket pêş.**R-3**



## 'Di Meclisa Enqerê de zimanê Kurdî tê înkarkirin'

Komisyona Hevgirtina Netewî Xuşk-Biratî ya Demokras ku di çarçoveya Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de hatibû avakirin, di 20'ê Tebaxê de bi Dayîkên Aştiyê û yên Şemiyê re hevdîtin kirin. Yek ji Dayîkên Aştiyê Nezahat Teke ku di hevdîtinê de amade bû da zanîn ku di Meclisa Enqerê de zimanê Kurdî tê înkarkirin.**R-2**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1303 31-Tebax-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# 'DEMOKRATÎKBÛNA SÛRIYÊ BI VÎNA GEL PÊKAN E'

Şêwirmendê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk Bedran Çiya Kurd diyar kir ku niha hikumeta veguhêz a Şamê bi yek reng û hişmendiyeke teng kar dike, ew jî dibe sedema kûrkirina pirsgirêkên Sûriyê. Herwiha Çiya Kurd destnîşan kir ku ew bi biryar in ji bo danûstandinan pêş ve bibin û peymana 10'ê Adara 2025'an pêk bînin.**R-5**



## 'Çareseriya doza gelê Kurd û Amazîxî ramanê Abdullah Ocalan e'



Nûnera Misrê di Rêxistina Kongrêsa Cîhanî ya Amazîxî de Emanî El- Wşahî destnîşan kir ku armanc ji Însiyatîfa Amazîxî ya ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan, danasîna doza Kurd û Rêber Abdullah Ocalan e û got, "Ji ber doza me û gelê Kurd heman doz e çareserî wê bi rêya Abdullah Ocalan be."**R-4**

## 'Qedexekirina li ser ziman berdewam e, lê xwepişaftin jî heye'




Serokê Komeleya Hereketa Zimanê Kurdî Subhî Uzgen da zanîn ku pêwîst bû serokatiya komisyonê derfet bidaba dayika aştiyê ku bi zimanê Kurdî axivîba û got, "Piştî pêvajoyê hêviya gelê Kurd çêbû, lê qedexekirina zimanê Kurdî berdewam e."**R-7**

## Roja Aştiyê ya Cîhanê



Di sala 1939'an de 1'ê Îlonê bi Roja Aştiyê ya Cîhanê hate ragihandin, lê li şûna ku aştî pêk bê cûreyên şer li cîhanê pêş dikeve û hemû nirxên mirovahiyê bin pê dibe. Herwiha bi şer aştî pêk nayê, lewma heta ku aştî pêk bê divê şerên li cîhanê bi dawî bibin.**R-6**


**Li ser Rêya Nûreddîn Sofî**
Sînan Cûdî R-4


**Îsraîl li dijî MÎT`a Tirk li Sûriyê ji nepeniyê derbasî êrişên rasterast dibe**
Idrîs Henan R-5


**Yekê Îlonê û aşitî**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6


**Hunera herî mezin**
Remezan Olçen R-7

# 'Di Meclisa Enqerê de zimanê Kurdî tê înkarkirin'

Komisyona Hevgirtina Netewî Xuşk-Biratî ya Demokras ku di çarçoveya Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de hatibû avakirin, di 20'ê Tebaxê de bi Dayîkên Aştiyê û yên Şemiyê re hevdîtin kirin. Yek ji Dayîkên Aştiyê Nezahat Teke ku di hevdîtinê de amade bû da zanîn ku di Meclisa Enqerê de zimanê Kurdî tê înkarkirin.

**Amara Baran/Qamişlo**

Nezahat Teke yek ji Dayîkên aşitiyê ye ku di sala 2000'î de keça wê Nesrîn Akmen di 18 saliya xwe de pişte dîlgirtina Rêber Apo agir bera bedena xwe dide û şehîd dikeve. Ev 26 salin ku dayîka Nezahat Akmen soz dide keça xwe ku heta hênaseya xwe ya dawiyê li ser şopa wê bimeşe û xewn û xeyalên wê yên aştî û jiyaneke azad pêk bîne. Bi banga Rêber Apo ya Aşitî û Civaka Demokratîk re Nezahat Akmen ku wek her dayikeke aşitiyê şahîdî ji pêvajoya îmhakirina çekan û di heman demê de di civîna ku Komîsyona Hevgirtina Netewî Xuşk û Biratî ya Demokrasî a bi dayikên aşitiyê re jî amede dibe. Komîsyona Hevgirtina Netewî Xuşk û Biratî ya Demokras di çarçoveya Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de hatibû avakirin, di 20'ê Tebaxê de bi Dayîkên Aştî û yên şemiyê re civiyan. Yêk ji Dayîkên Aşitiyê Nezahat Teke ku di civînê de amade bû ji Rojnmeya me re axivî.

**'Rêber Apo bi payama xwe hêviyên me geş kir'**

Nezahat Teke diyar kir ku bi peyama Rêber Apo hêviyên wan geşbûn û wiha bilê vkir: "Di şerê 50 salî de yên ku herê zêde êş kişandin dayik bûn, gelek dayîkan girtîgeh û binçavkirin dîtin, gelek dayikan jî zarokên xwe winda kirin. Bi peyama Rêber Apo re hêviyek li cem me çêbû. Gelek caran ji aliyê Rêber Apo ve gav hatine avêtin û agirbest çêbûne, lê dewleta Tirk hemû agirbest binpê kirin û êrîşên xwe yên qirkirinê domandin. Ji ber wî jî heta niha baweriya me li hemberî dewleta Tirk qels e, lê ji ber ku gavên ku ji aliyê ji Rêber Apo ve hatine avêtin, em bawerin û di wê hêviyê de ne ku wê serkeftin pêk were."

**'Hêviyên ji dewletê ew e ku gavan bavêje'**

Nezehat Teke ku di merasîma îmhakirêna çekan de jî amadebû wiha hêviyên xwe anî ziman û got: "Piştî ku Rêber Apo di 9'ê Tîrmehê de peyamek bi dîmen şand, Tevgera Azadiyê di 11 Tîrmehê de komek gerîla çekên xwe îmhakirin, em li bende bûn ku piştî îmhakirina çekan dewleta Tirk gavên erênî biavêje û hêvî bide gel. Em mal bi mal kolan bi kolan ji gel re cîvînan çêdikin û behsa aştî û hevgirtina gelan dikin, hêviyên gel jî ji dewletê ew e ku gavan bavêje. Heta niha rewşa girtîgehan nehatiye guhertin û bi hezaran girtiyên ku hijmara wan nayê zanîn cezayê wan xilasbûye lê înfazê wan hatine şewitandin, di heman demê de girtiyên nexweş jî rastî gelek tundiyan tên. Ya esasî jî tecrîda li ser Rêber Apo heta niha didome, heta ku tecrîd ranebe wê çareserî ne pêkan be, dewlet jî baş dizane pêvajo bi Rêber Apo wê bi ser bikeve. "






**'Di MeclIsa Enqerê de zimanê Kurdî tê înkarkirin '**

Teke wiha behsa rêveçûna pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk kir û got: "Piştî ku Dewlet Bahçelî di meclisê de bang li Rêber Apo kir got bila were meclisê di civîna Partiya Demê de amade bbibe, pêvajo derbasî qonaxeke nû bû. Lê heta niha jî em nikarin di kolanan de daxuyanî bidin, ger navê Rêber Apo tê gotin polîs êrîş dikin, gelo bi wan kiryarên ku tên meşandin wê çiqas baweriya me bi dewletê hebe. Li ser daxwaza Rêber Apo komîsyoneke ji 51 kesî hat avakirin. Komîsyon piştî ku çar civîn di meclisê de lidarxist, biryar girtin ku ji Dayikên Aşitî, Dayikên şemiyê û bi dayikên esker û polêsan re jî civîn bê li darxistin. Berya ku em beşdarî civînê bibin gotin her dayîkek wê 15 deqe biaxive û bi zimanê tirkî nirxandin bên kirin. Jiyana me ya 50 salî nakeve 15 deqan jî lê ji aliyê ziman ve em bi fikar bûn ger em nikaribim di meclisa Tirkiyê de bi zimanê xwe biaxivim tê wateya hebûn û nasnameya mie hê jî tê înkarkirin. Pirsgirêk ne bi tirkî axaftine, îro zimanê me tê înkarkirin, berya hertiştî pêwîst e zimanê Kurdî bibe zimanê fermî."

**'Bila êdî dayik êşê nekêşin'**

Dayîka Aştiyê Nezahat Teke bal kişand ser axaftina li meclisê û wiha axivî: "Li gor lîsteya ku ji aliyê komîsyonê ve hatibû amadekirin hemû dayîkan yek bi yek nêrînên xwe dan, dema ku dor hat min, min got ku ez dayîkek Kurd im ji Amedê hatime û min yek bi yek hemûyan silav kir. Em di sedsala 21'mîn de dijîn lê mafê min yên ku ez di Meclisa Enqerê de bi Kurdî biaxivim nedane min. Civîna ku bi rêveberiya Nûman Kurtuluş de dihat meşandin, ji aliyê Nûman Kurtuluş ve mûdaxale hat kirin ku bi Tirkî biaxivim. Lê qasî ku tirkiya min têrê kir ez axivîm."

Tecrîda li ser Rêber Apo tecrîda li ser mirovahiyê ye keçamin di 18 saliya xwe agir bera bedena xwe da rûxmê ku 26 Sal derbasbûye jî hê jî bêhna porê wî û laşe wî yê ku şewitiye li ber pazamine, min wek dayîk wî êşê kişand bila dayikên din wî êşê nebinin, Ez îro ji bo wî livêderê me. Aşitî bi çûyîn hatinê heyete li îmraliyê ku mêhê carek diçe û tê çareser nabe çima heta niha gav neghatine avêtin. Gelek qehremanên ku şehîd ketin cenazeyên wan bi kargoyan ji dayikên wan re tê. Ez dizanim aşitî çêbe jî keçamin venagere lê dema ku dayîkên din zarokên xwe hembêz bikin û bibinin wekê ku min keça xwe dîtibe û hembêz kiribe."

# Cîhaneke azad wê bi destê jinan were avakirin

**Asya Weşûkanî**

Em dibînin ku gelên Sûriyeyê dengê xwe bi dengê gelê Kurd re bilind dikin û dibêjin "Azadî û xelasiya me bi gelê Kurd re ye." Ev jî bingehê xwe ji fikir, raman û paradîgma Rêber Apo digire. Gelên herêmê bi taybet jî gelên Sûriyeyê rastiya heyî pir baş fêm kirine û dixwazin beşdarî paradîgmaya Rêbertî bibin.

Bêguman desthilatdarên herêmê û hêzên hegemon vê qebûl nakin. Di serweriya xwe de serhişkiyê dikin. Ew serhişkiya wan jî wê herêmê û tevahî cîhanê bibe Mehşerê (Roja Qiyametê). Ev xisûs jî xeteriya herî mezin a li ser serê mirovahiyê ye. Hişmendiya desthilatdar û mêrperest a 5 hezar salan îro nûnertiya xwe di pergala sermayedariya navendî de dibîne. Hîn jî pergala sermayedar li ser dijberiya xwe ya li hember civakê israr dike. Ji bo vê her çi ji destê wan tê texsîr nakin. Vê pergala sermayedar hêzên tundrew û cîhadîst jî kirine hevkarên xwe. Hewl didin wan hêzan bikin desthilatdar û bi destê wan jî berjewendiyên xwe pêk bînin. Ev di roja me de bi aloziya li Filistînê dest pê kirin, li Lubnanê dewam kirin, ji wir jî gihiştin Sûriyeyê û piştre jî berê xwe dan Îranê. Gelo wê piştre berê xwe bidin ku derê. Li gorî ku xuya dike senaryoya ji bo Tirkiyeyê jî amade ye. Niha jî mirov dibîne ku li her deverê şer û alozî hene. Di wan şeran de weke her tim jin û civak dibin qurbanî. Ji ber di xwezaya desthilatdariyê de valatî nayê qebûlkirin, timî ji bo wê şer û pevçûn hene. 5 hezar sal in û dibe ku beriya wê jî be ku desthilatdarî derketiye hole. Ji wê demê ve, ne ji bo jinan û ne jî ji bo civakan aramî û azadî çêbûye.



Yên pêdiviya wan bi azadî, aştî û demokrasiyê heye jin û civak e. Lê mixabin ên di serdema me ya niha de ji aramî û azadiyê bêpar in jî ew in. Ji ber vê pêwîst e jin û civak xwe bikin yek. Yekîtiya jinan û gelan divê were çêkirin. Dîsa divê di pêşengiya jinan de civaka exlaqî û polîtîk pêş bikeve û were parastin. Rêber Apo rol û mîsyona pêşentiyê daye jinê û hewce ye jin jî li ser vî esasî têkoşîna xwe pêş bixe.

Teqez divê were zanîn ku wê jin doza xwe ya azadî û wekheviyê terk nekin û di her şert û mercî wê bidomînin. Ev li hemû qadên têkoşînê mîna rojê xuya ye. Weke jin em ê timî ji bo serxistina pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk a Rêbertiya me daye destpêkirin bixebitin.

Ez vê weke weke peymana jinan a bi azadiyê re dibînim û baweriya min heye ku wê cîhaneke azad bi destê jinan were avakirin. Divê mêrên di nav civakê de jî bi jinan re ji bo avakirina jiyana azad, wekhev û bi edalet di eniyên têkoşîn û berxwedanê de cihê xwe bigirin.



# 'Qedexekirina li ser ziman berdewam e, lê xwepişaftin jî heye'

Serokê Komeleya Hereketa Zimanê Kurdî Subhî Uzgen da zanîn ku pêwîst bû serokatiya komisyonê derfet bidaba dayika aştiyê ku bi zimanê Kurdî axivîba û got, "Piştî pêvajoyê hêviya gelê Kurd çêbû, lê qedexekirina zimanê Kurdî berdewam e."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Nêzî şeş mehan e ku banga Rêber Apo ya ji bo pêkanîna pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk hatiye destpêkirin, da ku şer bi dawî bibe û gelên Kurd mîna gelên Tirk mafê xwe ji hemû alî ve bi dest bixin. Tevî vê bangê jî hîna gavên hiqûqî bi rengekî hiqûqî ji bo mijarên weke azadkirina girtiyan, şerê nijadperestî, qedexkirina li ser ziman a ku ji hêla dewleta Tirk tê, didomin. Derbarê qedexekirina zamên Kurdî li Bakurê Kurdistanê, Serokê Komîteya Hereketa Zimanê Kurdî Subhî Uzgen ji rojnameya me re axvî.

**'Pêwîst bû rê dabana dayika aştiyê ku bi Kurdî biaxive'**

Subhî Uzgen da zanîn ku pêwîst bû serokatiya komisyonê derfet bidaba dayika aştiyê ku bi zimanê Kurdî biaxivîba û wiha got: "Ji bo meşandina Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk, destpêkê dewleta Tirk xwest ku navê wê bibe Tirkiya Bêteror, lê vê yekê sifeteke nexweş îfade dikir paşê navê wê Komisiyona Demokrasî, Xuşk-Biratî û Hevgirtina Netewî hate avakirin. Her kes dizane ev komisiyon ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurdî ava bûye. Gelek kesên nijadperestên Tirk li dijî kar û xebata komisiyonê ne, lê bi awayekî giştî her kes bi rengekî erênî avakirina komisiyonê dinirxîne. Weke tê zanîn ku di heftiya bûrî de civateke komisiyonê hat lidarxistin û têde jî hin dayikên endamên PKK'ê ku navê wan dayikên aştiyê ne li civatê amade bûn. Di wê civatê de dayikek ji wan xwestibû bi zimanê Kurdî biaxive, serokatiya komisiyonê rê neda wê ku biaxive, ev yek jî gelekî hate rexnekirin, em jî rexneya xwe derbarê de tînin ziman, pêwîst bû ku mafê axaftina bi Kurdî ji bo dayikê bihatiba dayîn û her kes lê guhdar bikiriba. Ji bo ku zimanê Kurdî bibe zimanekî fermi dive civata Kurdî li ser doza vê yekê bi israr be."

**'Piştî pêvajoyê hêviya gelê Kurd çêbû, lê qedexekirina zimanê Kurdî berdewam e'**

Uzgen destnîşan kir ku piştî pêvajoyê hêviya gelê Kurd çêbû, lê qedexekirina zimanê Kurdî berdewam e û wiha bi lêv kir: "Dema ku Devlet Bahçelî di meclisa Tirkiyê de ji bo destpêkirina pêvajoyê axivî û bang li Abdullah Ocalan kir, bi şûn de hêvî û rihetiyeke mezin li tevahiya Tirkiyê çêbûye. Di heman demê de ew tundiya berê heya radeyeke baş nema ye, lê belê xedexeya li ser ziman û çanda Kurdî hîn berdewam e. Ji sala 2012'an ve mafê dayîna dersên zimanê Kurdî li dibistanên navîn heye, lê dewletê ev yek nedaye nasandin, hem jî gelê Kurd li van dersan xwedî derneketiye. Van 30 salên dawîn li Tirkiyê doza fermîbûna zimanê Kurdî nehatiye kirin, hem jî zimanê ku bi riya wê siyaset dihat meşandin ne Kurdî bû, li aliyekî din koçberiyeke mezin a Kurdan ji gundan ber bi bajarên Tirkiyê ve çêbû, pişaftin weke lehiyekê bi ser Kurdan de hat. Di roja îro de li 5 zanîngehên Tirkiyê beşa Ziman û Edebiyeta Kurdî hey, nêzî 3 hezar kes jê derçûne û niha tenê 300 kes ji wan dest bi kar kirine. Hewldan ji hêla hin sazî û kesayetên ku mijûlî ziman dibin, hene, di sala Koronayê de me komeleyek bi navê Herketa Zimanê Kurdî ava kir, da ku em zimanê Kurdî bixin zimanê fermî û perwerdehiyê."

**'Dewleta Tirk dixwaze Kurdan bê statû bihêle'**

Serokê Komeleya Hereketa Zimanê Kurd Subhî Uzgen diyar ku Tirkiyê dixwaze bi rêbazên xwe Kurdan li Rojava û Bakurê Kurdistanê bê statû bihêle û wiha qedand: "Weke Komeleya HEZKURD û dildarên zimanê Kurdî, me kampaniyeke û



daxwazeke bi Kurmancî, Zazakî û Tirkî amade kiriye, da ku ji serokatiya Komisiyona Demokrasî, Xuşk-Biratî û Hevgirtina Netewî jê re bişînin. Xebatên wiha fermî, wê encameke baş ji bo rewakirina zimanê Kurdî di dewletê de bi xwe re bîne. Dewleta Tirk xwedî armanceke wiha ye ku dixwaze bi rêbazên xwe li Rojavayê Kurdistanê Kurdan bê statû bihêle, li aliyekî din dixwaze PKK'ê û Abdullah Ocalan iqnaa bike Kurdan li her derê bê statû bihêle, lê ev yek nepêkan e. Divê em dozgerên mafê netewî yê Kurdî bin û bi rengekî ektîv kar bikin, hejmara gelê Kurd bêtirî nîvî ji gelê Tirkiyê ye, pêwîst e em bi awayekî baş kar bikin û daxwaza statû û mafê xwe bikin, eger ev pêk were wê kar û xebata komisyonê bi encam bibe."

# Gundê Zixatê

**Ayşa Silêman/Dêrik**

**Gundê Zixatê yek ji kevintirîn gundên Rojavayê Kurdistanê ye ku beriya 3 hezar sal ji hêla Aşûriyan ve hatiye avakirin. Di gunde gireke kevnar heye û axa gund ji bo tevahî cûreyên çandiyê guncav e.**

**Navê gundê Zixatê**

Gundên Rojavayê Kurdistanê dergûşa şaristaniyê ne, yek ji kevintirîn gundên herêmê, gundê Zexatê ye ku beriya 3 hezar sal ji aliyê Aşûriyan ve nav lê hatiye kirin. Ji ber ku axa gund dewlemend bû û hertim kanî têde diteqiyan û zêde dibûn, ev nav ji zayînê hatiye. Di vî gundî de girekî kevnar heye li ser wî girî qesra Omer Axa hebû û têde dijiya, ku ew ji eşîra Hesinî bû lewma hemû kesên vê eşîrê xwe li gund girtibûn, ji ber vê yekê bi deşta Hesina dihat naskirin. Ev gund mîna daristanekê lê hatibû ji ber ku ava wê zedebû hemû cûreyên giya û daran têde şîn dibûn û mezin dibûn. Her wiha ev giyayên ku şîn dibûn, wek derman dihatin bikar anîn. Heye van salên dawî jî ji ber pirbûna avê gundiyan ji tevlî genim, birinc û pambû jî diçandin.

Dîroka gundê Zixatê

Omer Axa û keça Hemko Wedha bi hev re zewicîn û li ser girê Zixatê di qesra xwe de bicih bûn. Di wê demê de 40 gayên wî hebûn û bi wan cot dikirin. Di heman demê de di gund de pirek hebû ku gelek gund û bajar digihandin hev, çi kesê ku di ser pirê re derbas dibûn Omer Axa bac ji wan distandin. Di sala 1920'an de piştî ku Ferensa ev herêm xist bi kontrola xwe êdî ji sala 1920'an heya 10 salan jî kes di gundê Zixatê de ne dijiya, ji ber ku gund wek daristanê bû û



gundî ditirsan bijîn. Di salên 1946-1947'an Feransa hemû gundên herêmê li Axayan belav dikir û mal û zeviyên gundiyan li ser navê axa dinivîsandin û gundî ji hertişî mehrûm dikirin. Zarokên Egîd Resûl Axa ku ji gundê Til xenzîr bûn, di navbera wan û Ferensa de lihevkirin çêbû ku gundê Zixatê bidin wan. Piştî li hevkirinê êdî hersê kurên Egîd axa û dayîka wan Xensa di gund de cih girtin, heya roja îro jî hin mal û milk di gund de hene li ser navê wan e. Êdî ji nû ve gel hatin di gund de bicih bûn û gund hat avakirin û hemû gundiyan kar û xebat dikirin dibin xizmeta axan de.

**Bandora hişmendiya axeyan**

Ji ber ku desthilatdariya axan bandor li hişmendiya gundiyan kiribû, piştî ku Şoreşa Rojava li darket jî wan guhertin di hişmendiyê xwe de qebûl nedikirin. Gundiyê bi navê Rêzan Meirûf ji ber ku wî partî baş naskiribû û pirojeya netewa demokrat zelal bû ji bo wî, lewma wî gelek serlêdana mala gundiyan dikir, lê gundiyan gelek caran ew ji malên xwe derdixistin û axaftinên wî qebûl nedikirin. Lê piştî israr û keda sala wî karî guhertinê di hişmendiya gundiyan de çêke û niha jî dest bi avakirina komînekî di gund de dikin.



## Hunera herî mezin

**Remezan Olçen**

1'ê Îlonê Roja Aştî ya Cîhanê îsal jî dîsa di bin siya şer û xwînê de hat pêşwazîkirin. Tevî ku hunera herî mezin aştî ye jî serdest û desthilatdar bi xwîn, êş û azar û mirinê vê hunerê ji mirovahiyê didizin. Helbûkî piştî Şerê Duduyan ê Cîhanê di encama têkoşîna mezin a civakan de dewletdar di kêliyeke dîrokî de mecbûr man kumê xwe daynin ber xwe. Roja ku Hîtlerê Nazî êriş bir ser Polonan û bû despêka şer weke roja aştiyê qebûl kirin. Bi vê pejirandinê re dixwestin bibêjin ku bila mirovahî vê roja ku bû despêka ewqas êşa mezin ji bîr neke ku bila careke din xwe dûbare jî neke.

Lê nebû. Serdestan tim bi civakan êş dan kişandin. Weke ku çarenûseke bêyî şer ne mimkûn be weke ku ev qeder be nîşan dan. Heta radeyekê jî divê armanca xwe de bi ser ketin. Îro roj tu mirovek li ser rûyê zemînê tine ku êşa şer bi awayekî neketibe nav jiyana wî/ê û jiyan lê neherimandibe. Şer jiyanê jehrî dike. Lê jehrkuja wê jî heye aştî. Aştî belkî ji bo mirovahiyê giştî îro roj hêviyek zenûn be. Dibe ku nebûna şerî jî weke aştiyê bê dîtin. Lê aştî ji van têgîn û rewşan pir cudatir e. Ew kamilbûn û xwegihandina heqîqeta bihevrebûn û serbestiyê ye. Dêhna xwe bidinê serdestî bi xwe re bindestiyê jî weke rewşekê derdixe hole lê serbestî tişteke din e. Serbestî lêgerîna li hunera aştiyê ye. Li çûkeke biçûk bifikirin di nav qefesê de xwe çawa li vî alî û li wî alî êend dike. Fir dide xwe ku xwe ji wê bindestiyê rizgar bike, xwe ji wê rewşê aza bike. Li serbestiyû li aştiyê aştiyê digere. Ew çûka biçûk û delal jî dizane ku aştî ahenge gerdûnê ye. Serdestan ji xwe re çîrokeke çêkiriye ku gerdûn di encama kaosê de çêbûye. Ev xapandineke mezin e. Gerdûn di nava ahengekê de çêbûye. Şev jî delal e roj jî delal e. Aheng di vir de ye. Aştî di vir de ye. Zivistan jî delal e bihar jî delal e. Aheng di vir de ye. Ji duduyan yek yanî aheng yanî aştî çêdibe.

Di vê dewra ku çarmedor di nava şer û xwînê de ye, lêgerîna li aştiyê hunera herî mezin e. Dema mirov bi vê serwextiyê li lêgerîna çareseriyê ya Rêber Apo dinêre, hinge mirov têdigihîje ku kar û xebata dike, ked û emega wî ya ji bo aştiyê, ji bo dawî li şer bê çiqas biqîmet e. Ji ber wê jî em li xwe vegerin û ji xwe bipirsin, em çiqas ji bo aştiyê dixebitin. Em çiqas ji bo serbestiyê dixebitin. Qedera me ne qefes e. Heqîqeta me fira bi baskên aştiyê ye.

# Roja Aştiyê ya Cîhanê

Di sala 1939'an de 1'ê Îlonê bi Roja Aştiyê ya Cîhanê hate ragihandin, lê li şûna ku aştî pêk bê cûreyên şer li cîhanê pêş dikeve û hemû nirxên mirovahiyê bin pê dibe. Herwiha bi şer aştî pêk nayê, lewma heta ku aştî pêk bê divê şerên li cîhanê bi dawî bibin.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Her sal 1'ê îlonê wekî Roja Aştiyê ya Cîhanê tê pîrozkirin. Di 1'ê îlona sala 1939'an de artêşa Alman di bin fermandariya Adolf Hîtler de Polonya dagir kir û Şerê Cîhanê yê Duyemîn dest pê kir. Ev şer bû sedema mirina zêdeyî 50 mîlyon mirov. Piştî vê yekê ev roj, li hemû cîhanê weke "Roja Aştîyê ya Cîhanê" hat ragihandin. Li gel ku 1'ê bi Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê hate ragihandin jî, lê heye niha aştî pêk nehatiye, berovajî wê hemû pîvanên aştiyê tên binpêkirin ku her roj bi sedan mirov têne kuştin û bi hezaran mirov têne koçkirin.

**Pênaseya aştiya cîhanê**

Têgeha aştiya cîhanî, an aştiya gerdûnî, ew aramî û ewlehiyê di navbera gelan de ye. Ew bi nebûna êrişkarî an tundûtûjiya fizîkî an exlaqî li ser asta gerdûnî tê temsîlkirin ku bêyî şer û pevçûnên leşkerî, lê bi rêya diyalogê û sepandina nirxên rastî û edaletê têne çareserkirin.

Girîngiya aştiya cîhanê

Girîngiya aştiya cîhanê di pêşvebirina pêşketina aborî û civakî, başkirina asta perwerde û tenduristiyê, misogerkirina aramiya civakî, dabînkirina hawîrdorek guncaw ji bo berdewamiya şaristaniyan, kêmkirina tundûtûjî û pevçûnan û pêşvebirina mafên mirovan de eşkere ye. Ew ji bo avakirina pêşerojek geş û cîhanek dadmendtir ji bo hemû gelan girîng e.

Pêşveçûna aborî û civakî: Aştî rê dide welatan ku di çavkaniyên xwe de pêşketinan pêk bînin ku ne wan li ser şeran xerc bikin, ev yek jî rewşa aborî ya civakê baş dike.

Baştirkirina perwerde û tenduristiyê: Aştî alîkarîya dabînkirina perwerde û lênêrîna tenduristiyê ji bo her kesî dike.

Aramiya civakê: Aştî rêkûpêkiyek sabît peyda dike û ji bo berdewamî û pêşveçûna mirovahiyê mercekî bingehîn e.

Avakirin û domandina şaristaniyan: Aştî alîkariya berdewamiya şaristaniyan dike û pêşî li hilweşîna wan digire, wekî ku di dîrokê de ji ber şeran qewimiye.

Di pêkanîna aştiyê mafên mirovan: Aştî ji bo bidestxistina mafên mirovan û pêşvebirina prensîbên edalet û wekheviya zayendî pir girîng e.

Çareseriya Nakokiyan: Aştî rêya guncav ji bo çareserkirina nakokiyan peyda dike bi awayên ku rêz li nirx û prensîban digirin.

**Li şûna pêkanîna aştiyê cûreyên şer pêş dikeve**

Di dîroka mirovahiyê de bi hezaran şer çêbûne. Gelek şer nebûne malên dîrokê û neketine ropelên wê de. Lê hin şer hene hem ji ber ku gelek mirov hatine kuştin, hem jî ji ber teknîk, taktîk û rêbazên xwe di rûpelên dîrokê de cihên xwe girtine. Bi piraniya şerên di navbera du aliyan de pêş ketine, aliyekî êriş kiriye, aliyê din jî li dijî êrişan parastina xwe kiriye. Ji ber vê yekê li ser rûyê cîhanê gelek keleh, sûr û birc hatine avakirin. Herwiha berê tenê şerê bejayî hebû. Pişt re kelek û keştî çêkirin û bi rêya deryayê dest bi seferên êrişan kirin. Niha jî şerê li bejayî, derya û li ezman bi hev re pêş dikevin. Li aliyê din alav û amûrên şer jî her ku diçe pêş dikevin. Êdî tenê bi tifing, tang, top, fuze, balafir û teqemeniyan şer nakin. Şerê avê, şerê çekên kimyewî û gelek cûreyên şer pêş dixin. Hemû şer ji bo aliyek axa aliyê din dagir bike. Ji bo çavkaniyên dewlemendiyê yên ser erd û bin erd dixin bin kontrola xwe. Hem jî mirovên wî welatî wekî kole di bin kontrola xwe de bidin xebatindin. Lê aştî di nava şer de ne pêkan e. Ji bo wê pêşketinên cûre û amûrên şer, dibe sedema ku heya niha li cîhanê aştî pêk neyê.

**Bidawîbûna şer rêya destpêkê ya aştiyê ye**

Di dîrokê de gelek şerên mezin pêş ketin. Şerê navbera dewletan û şerê global de bi sed milyonan mirov hatin kuştin. Di van şeran de gelek cûreyên çekan hatin bikaranîn. Li gel ku ew qas xwîn rijiya û bi milyonan mirov hatin kuştin jî, dîsa hêzên navdewletî di şer de israr dikin. Li gel ku peyman û quralên şer di nava dewletan de hatin îmzekirin û qebûlkirin jî, lê dîsa ev peyman û quralan binpê dikin. Her roj bi sedan mirov li ser rûyê cîhanê di şer de tên kuştin. Di dîroka mirovahiyê de heta niha 10 şerên mezin ên ketine qeydan hene. Di van şeran de bi milyonan mirov hatin kuştin. Lê ji bo şer bi dawî bibe û aştî pêş bikeve, her tim hevdîtinên dîplomatîk û diyalog pêş ketiye. Da ku bi rêya diyalog û peymanan dawî li şerên bi xwîn bînin. Lê gelek caran ev hewldan bi ser neketine. Ji bo aştî pêş bikeve pêwîst e têkiliyên ku sinc û polîtikayê bi hev girê dide hebin. Lê heye niha li ser asta cîhanê hîna şerên mezin rû didin.



**Bi şer pirsgirêk çareser nabin**

Di 20 salên dawî de li ser axa Rojhilata Navîn Şerê Cîhanê yê Sêyemîn pêş ketiye. Navenda Şerê Cîhanê yê Sêyemîn Kurdistan û Rojhilata Navîn e. Herî zêde li ser Pergala Modernîteya Demokratîk ku kurd dixwazin ava bikin ev şer tê meşandin. Ji bo çareseriya demokratîk bi dehê caran Rêber Apo banga diyalog û aştiyê li dewleta Tirkiyê kir ku şerê bide rawestandin, ji ber ku bi rêya şer pirsgirêk çareser nabin. Rêber Apo di têkoşîna xwe ya bi salan girîngî daye diyalog û aştiyê, hem jî tekez kiriye ku bê vê yekê dawî li pisgirêkên Rojhilata Navîn giştî jî nayê. Ji bo wê Rêber Apo her li ser rêya aştiyê bi israr bû, li ser vê bingehê di 27'ê de bi navê Aştî û Civaka Demokratîk bangeke dîrokî kir ku vê bangê ne tenê li Rojhilata Navîn deng veda û bandor kir, lê li tevahî cîhanê xwedî heman bandor bû.

**Banga Rêber Apo ya aştî**

Banga Aştî û civaka Demokratîk a Rêber Apo ne tenê li Kurdistanê û Tirkiyê bandor kir, lê bandoreke mezin li Rojhilata Navîn jî kir. Ji ber di Rojhilata Navîn de gelek şer û pevçûnên ku li ser rûyê erdê rû didin hene û hîna jî berdewam dike. Rêber Apo herî zêde dîrok û rastiya Rojhilata Navîn bi awayekî zanistî û felsefîk ji hev derxistiye, analîz kiriye û rêyên çareseriyê danîne. Polîtîkayên sedsalê yên pergala modernîteya kapîtalîst a li ser vê herêmê xuya ye, lewma dê bi vê banga dîrokî re wekî berê ev polîtîke nemeşin. Pergala kapîtalîs û hêzên serdest ên cîhanê beriya sed salî bi danîna sînorên netew-dewlet belayeke mezin anî ser gelên herêmê. Bi avakirina desthilatdariyê zihniyetên xirab, polîtîkeyên komkujî, birçîbûn, sirgûn û hwd…li ser gelan hatin meşandin. Vê yekê gel tengaz kir û ji bo derketina ji vê rewşa xirab, gel li rêyên çareseriyê û kesên xilasker geriyan. Têkoşîna Azadiyê û Rêzgariya Neteweyî ya Gelê Kurd a bi pêşengiya Rêber Apo ya 52 salan gelek guherînên girîng li herêmê pêk anîn. Gelên herêmê tenê xilasiya xwe di nirxên bingehîn yên mîna aştî, azadî û demokrasiyê de dibînin. Bi vê banga dîrokî dê Rojhilata Navîn ji nû ve li koka xwe vegere, ew aştî, azadî û demokrasiya ku bi salan e jê dûr ketiye, careke din bigihêjê.

Pêkanîna vê bangê dê ne tenê ji pirsgirêka Kurd û Tirkiyê re çareserî be, hem Kurdistanê, Rojhilata Navîn û hem jî cîhanî re bibe rêya aştiyê. Lewma ya girîng ku hemû dewlet û mirov xwe di vê çarçoveya aştiyê de bibînin û wê pêk bînin, ji ber rewşa mirovahiyê ber bi kaosê mezin ve çûye, niha dema çareseriyê ye, heger aştî pêk neyê şerên mezin dê derkevin holê û şerên heyî gur bibin.



## Yekê Îlonê û aşitî

Hafiz Ahmet Turhalli

Yekê Îlonê weke roja Aşitî Ya Cîhanê hatiye pejirandin. Aşitî gotarekî pîroz e: lê di devên zalim û mêtîngeran de bûye weke benîşt û nerehetiyê dide mirovên xwedan maf û bindest. Heta neha kesên zalim û zordest bi navê aşitiyê gelek tiştên ne rewa û nelirê pêşxistine. Welatê me bi navê aşitî dagir kirine. Navê lihevkirina Lozanê ku welatê me kiriye çar perçe, weke lihevkirina aşitiyê hatiye binavkirin. Dema desthelatdar behsa aşitiyê dikin, divê mirov zanibe ku an hêza wan qels bûye an jî nêzî têkçûnê ne. Aşitî gotarekî ku li gor ayînan pîroz e, Ayina Cihutî, Budîzim, Konfîçyus û Filetî ji serî heta jêrê behsa Aşitiyê dikin. Ola Îslamê bixwe wateya wê aşitî ye û ji bo mirov bi xwe, derodora xwe, xwezayê û bi Xweda re bikeve nava Aşitîyê weke planekî datîne pêşberî bawermendan! Nexşerêya Qur'an a pîroz li ser Aşitîyê hatiye amadekirin. Xweda di Qura'ana pîroz de weha dibêje: „Ey gelî bawermendan! Hemû bihevre (Bi yek carî) têkevin nava aşitiyê. Li pey gavên Şeytanî neçin; lewre ew neyarê we yê eşkere ye." (Beqere 208)
Yek ji navên Xweda Selam e; wateya wê aştiyê. Li gor nexşerêya Qur'ana pîroz, armanca sereke ya bawermendên ayina Îslamê, pêkanîna aşitî û aramiyê ye. Xweda ji bawermendan dixwaze li vê dinê welatên aram û civakên aştîxwaz saz bikin. Dibêje: kesê aramî û aşitiyê saz neke, ji bo wê kar neke, dibe şopdarê Îblîs û ehlê dojehê.
Belê ji ber piştî koça Pêxemberê me Hz Mihemed sXl, aramî û aşitî ji nava civaka Misilmanan hate rakirin û şûna wê de şer, pevçun, talan û îşxal pêşket. Xaka me Misilmanan bûye weke dojehê.
Kuştin, malwêranî û xizanî bûye perçeyekî bingehîn yê jiyana me.
Kê hêz bidest xist, dest pê kir yê dîtir perçiqand û ji holê rakir.
Şer û pevçun bê navber 1400 salî zêdetire berdewam dike. Bi navê Îslamê dijberiya Îslamê dikin.
Bihizirin oleke ku navê wê aşitî be û alîgirên wê olê tenê şer û pevçunan bikin!
Divê em bi fikirin ev çi sosrete em dijîn û kê me xiste vê rewşê de?
Neha li çar hêlên cîhanê tilî li ser tetikanin û ji bo hevdû bikujin diranan lihev diseqînin.
Divê kesê misilman ji bo aşitiyê kar bike, ji bo pêşî li şer û malwêraniyê bigre, xwedan gotin û tekoşînî be.
Îro bizava Kurd di nava vî agirî de dixawze av û selametiya aşitîyê zêde bike. Lewre kesên herî zêde ji şer û pevçunan zerer dîtine Kurd bixwe ne. Bi hevre şer kirine, bi dewletên hawîrdorê re ev çensd sal in di nava şer de ne.
Ji bo wê ezmûna dîrokî û nexweş, milletê me bi salan e
Ji bo aşitiyekî adil tekoşînê dike.
Bi sedhezaran cangorî dan, hê jî ew ê ku bi israr aşitiyê pêş dixe û xwedan proje ye dîsa milletê me ye. Divê hemû gelên cîran jî ku zêdetirên wan bawermendên ola Îslamê ne, wê heqîqetê bibînin û bi hemû hêza xwe, mil bi mil têkoşîna aşitiyê bighînin serkeftinê.
Ger em karibin li Sûriyê aştiyekî adilane pêş bixin, em ê karibin aşitiya Rojhelata Navîn jî misoger bikin.
Di dîroka mirovahiyê de, şaristanî û pêşveçunên mirovî di demên aşitiyê de hatine cîbicîkirin. Demên aşitî û aramiyê de hêz û enerjiya mirov, ne ji bo xirakirin û têkbirina jiyanê ye, berovajî wê, ji bo pêşxistin û avakirinê ye.
Kesên bawermendên rasteqîn, divê destê gelê Kurd bigrin û aşitîya pîroz pêş bixin.



# 'Ji bo pêkanîna demokrasiyê têkoşîneke mezin tê xwestin'

Hevserokê PYD'ê Xerîb Hiso diyar kir ku di Kongreya Hevpeymaniya Civaka Demokrat ya Cîhana Erebî de tecrûbeya demokratîk li Kurdistan û herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke nimûneyeke ji bo parastina Sûriyê û çareseriya aloziyên herêmê derket pêş.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Li Silêmaniyê Kongreya Hevpeymaniya Civaka Demokrat ya Cîhana Erebî bi tevlîbûna dehan serkirde, rayeder û kesayetên ji 21 welatên cîhanê di 27'ê Tebaxê destpê kir. Şandeyek ji Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê beşdarî kongreyê bû, ku ji Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk Xerîb Heso, endamên desteya serokatiyê yên partiyê Foza Yûsif û Salih Muslim, berdevka partiyê Sema Bekdaş, endama Kongra Star Gulistan Gulo û endamê Dayîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Hikmet Hebîb pêk hat.

Kongir ji hêla Yekîtiya Niştimanî Kurdistanî hate li dar xistin, kongir ji aliyê Serokê Yekîtiya Niştimanî Kurdistanî Bafil Telabanî ve tê birêvebirin. Di kongir de Serokkomarê Iraqê Ebdulletîf Reşîd, Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Berzanî û hejmarek ji berpirsên din beşdar bûn.

Di kongreyê de gelek mijar û panelên cûda li ser mijarên navxweyî, herêmî û navdewletî hat nîqaşkirin. Armanca kongreyê xurtkirina peywendiyên navbera hêzên pêşverû yên Ereb û Kurd û pêşxistina hemahengiya navbera partiyên sosyal demokrate.

Bernameya kongreyê wiha bû:

Di roja yekem de mijarên jinan, beşdarbûna jinan a di biryarên siyasî ya li navendên siyasî û biryardanê de bê veqetandin. Her wiha seroka Yekitiya Jinên Sosyal Demokrat hate hilbijartin.

Di roja duyemîn de çar mijar hatin nîqaşkirin. Rûniştina yekem li ser "Avakirina Hevpeymanên Neteweyî û Herêmî û Piştgiriya Mafên Demokratîk û Rewşa Hemwelatîbûn û Hiqûqê" bû, rûniştina duyem li ser "Civîna Komîteya Endamtiyê bi Nûnerên Partiyên ku Serlêdana Endamtiyê di Hevpeymana Demokrat a Civakî de li Cîhana Erebî kirine" bû. Rûniştina sêyem li ser "Cihêrengiya Çandî, Zimanî û Olî wekî bingekeji bo Avakirina Dewletek Yekgirtî û Demokratîk" bû. Rûniştin çaremîn bi civîna "Komîteya Koordînasyona Navneteweyî ya Hevpeymaniya Pêşverû û Hevkarên wê yên Navneteweyî re ji bo Lêkolîna Zemînên Hevbeş ji bo Hevkarî û Koordînasyonê" bi dawî bû.

Di roja sêyem de 5 rûniştina hatin kirin di nav de mijara doza Filestînî û bandora wê li ser herêmê, rewşa siyasî û ewlehî li herêma Erebî û pirsgirêkên ku partiyên civakî yên demokrat û herêma Ereb pê re rû bi rû ne. Herwiha civînek rêxistinî ya Konseya Bilind a Hevpeymaniya Sosyal a Demokrat li Cîhana Ereb, raporek ji Komîteya Koordînasyonê ya Hevpeymaniya Civakî a Demokrat li Cîhana Ereb û Komîteya Koordînasyona Navneteweyî ya Hevpeymaniya Demokratîk, ji bilî komxebatên li ser çalakiyê ya hevbeş ji bo hevpeymaniyê, di nav xwe de girt.

Derbarê tevlîbûn û girîngiya kongirê Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê Xerîb Hiso ji Rojnameya me re axivî.

Hevserokê PYD'ê Xerîb Hiso diyar kir ku aramanca vê kongirê di çarçoveya navnîşana wê de diyar dibe û wiha got: "Ev kongir li ser asta partiyên siyasî hate lidarxistin, di heman demê de gelek kesayet li ser asta cîhanê tê de beşdar bûn da ku bi fikir û ramanê xwe kongirê zengîn û bihêz bikin, di heman demê pêşxistina tecrûbeyek demokratîk a guncav. Herwiha di demeke ku welatên Erebî û herêmê bi giştî de bi hewceyî ku demokrasiyê nîqaş bikin û pêwîstiya wan pê heye."



**'Rojhilata Navîn aloziyên mezin jiyan dike'**

Xerîb Hiso destnîşan kir ku di Rojhilata Navîn de pirsgirîkên mezin hene û wiha anî ziman: "Civaka vê herêmê di nava aloziyên pir mezin re derbas dibin, ev jî di encama siyaseta hêzên desthilatdar û hegemonîk ku şidetê dimeşînin ji bo parastina desthilatdarî û berjewendiyên xwe, her çiqasî şer û pevçûn hebe ewqsî berjewendiyên wan têne misogerkirin. Eger mirov di vê dema heyî de bala xwe bide dewletên erebî bi taybet beşeke ji Rojhilata Navîn li praniya wan tevger û şepêlên îslamî, olî û îslama siyasî pêşdikeve, lewma hêzên desthilatdar dixwazin herêmê veghuêzin navendeke ji bo hêzên îslamî û tundraw, ev yek jî metirsiyeke mezin bi xwe re tîne."



**'Tecrûbeya demokratîk a Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat nîşandan'**

Xerîb Hiso di axaftinên xwe de behsa hûrgûliyên komxebatê kir û wiha got: "Li bajarekî Kurdistanî weke Silêmaniyê ev komxebat hate lidarxistin giringiyekê nîşan dide. Mijarên sereke yên komxebatê û axaftinên beşdaran hemî li ser mijara demokrasiyê bû, çawa demokrasî di nava Rojhilata Navîn de bê rûnşkandin, ji xwe gava mirov behsa demokrasiyê dike gerek ne tenê di peyvan û klasîk de sînordar e, lê belê demokrasiyeke bi nirx be ne jî siyasî be, ku di bingeha xwe de civakeke demokratîk û azad ava bike; di axaftinan de ev hate nîşandan. Tecrûbeya demokratîk li Kurdistanê û herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di komxebatê de weke nimûneyeke ji bo parastina Sûriyê û çareseriya aloziyên herêmê derket pêş, di eynî demê de têkoşîn hate destnîşan kirin ji bo parastina vê tecrûbeyê da ku bibe alternatîfeke nû ji bo pêşeroja Sûriyê û çareserî ji bo dewletên ku aloziyan dijîn weke Lîbiya, Flestîn, Îraq û Lubananê, beşdarên ji van dewletan jî ev erê kirin û destnîşan kirin ku divê têkoşîna demokrasiyê xurt bikin û bidin pêş ji ber ku aştiyeke mayinde bi xwe re tîne, şer dide rawestandin, aramiyê dide avakirin, wekheviyê çêdike û koçberiyê disekinîne.

Her ku pîvanên demokrasiyê pêşbikeve ewqsî qebûlkirin jî çêdibe, çandên cuda di aliyê civakî û exlaqî de hevdu qebûl dikin. Di komxebatê de azadiya jinê esas girtin û mijarên girêdayî jinê hatin nirxandin."

**'PYD'ê wê tevlî hevpeymana demokratîk a civakî bibe'**

Xerîb Hiso wiha gotinên xwe berdewam kir: "Weke tevlîbûna partiya me di komxebatê de, Endamên Desteya hevserokatiya PYD'ê Salih Muslim û Foza Yûsif beşdarî du panêlan bûn, di panelan de bal kişandin li ser mijarên demokrasiyê, mijara kurdan di hundirê Sûriyê de û mijarên demokrasiyê, çawa di çarçoveya peymanan di herêmê de bidin pêşe. Ji xwe ya herî giring PYD'ê daxwaza xwe ya tevlîbûnê pêşkêş kir ji bo hevpeymanê, di komîsyona nîqaşkirina tevlîkirinê de ez tê de amadebûm, li ser dîroka PYD'ê şîrovekirin hate kirin û erê kirin di dawiya konhgireyê de tê diyarkirin."

**'Bandorên komxebatê bi têkoşînê çêdibe'**

Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratk PYD'ê Xerîb Hiso wiha gotinên xwe qedand: "Bandora vê kongeryê wê heta astekê çêbibe, di rojên komxebatê de tenê dengvedan e û encamên wê êdî piştî bidawîbûna wê be. Bandor wê di riya xebat, têkoşîn, rêbazê têkoşîna demokrat, hevkarî, danûstendin û girêdana van partiyan ji hev re, divê girêdaneke çêbibe û têkoşîna demokrasiyê di çi şêwazî de pêşbixînin. Şopndin û danûstendina pratîkê wê serkeftina vê koxebatê nîşan bê dayîn." Hêjayî gotinê ku ev kongir 4 rojan berdewam kir, her sal li welatekî cuda tê li dar xistin, her sal berpirs û serokê wê tê hilbijartin, di dawiya komxebatê de cihê li darxistin komxebatê ya sala bê tê diyar kirin.



# ‘Çareseriya doza gelê Kurd û Amazîxî ramanê Abdullah Ocalan e’

Nûnera Misrê di Rêxistina Kongrêsa Cîhanî ya Amazîxî de Emanî El- Wşahî destnîşan kir ku armanc ji Însiyatîfa Amazîxî ya ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan, danasîna doza Kurd û Rêber Abdullah Ocalan e û got, “Ji ber doza me û gelê Kurd heman doz e çareserî wê bi rêya Abdullah Ocalan be.”

**Jin Hisên/Qamişlo**

Derbarê Insyatîfa Amazîxî ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan, Nûnera Misirê di Rêxistina Kongrêsa Cîhanî ya Amazîxî de Emanî El- Wşahî bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Armanca Insyatîfa Amazîxî ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan çi ye?**

Însyatîfa Amazîxî ya Azadiya Rêber Abdullah Ocalan di Sibata sala 2024’an di heman salvegera 25’an a girtina têkoşer Abdullah Ocalan de hate damezirandin. Endamên çalakvanên tevgerê ji çend dewletan tevlîbûne. Armanca bingehîn ji destpêkirina însyatîfê ew e ku doza Abdullah Ocalan û doza Kurdî bi raya giştî ya Amazîxî re bidin naskirin. Herwiha baweriya me bi maf, edalet, rakirina zilmê û mafê diyarkirina çarenûsê ji bo gelê ku têkoşînê ji bo azadî û demokrasiyê di Rojhilata Navîn û bakurê Efrîqyayê dike, tê.

**Endamên însiyatîfê kîne û çiqas kar û xebat heta niha hatiye kirin?**

Endamê însiyatîfê ev in:



Serokê Partiya Lîbiya El-Uma (Lîbo) û serokê berê yê Kongrêsa Cîhanî ya Amazîxî-Fethî Nexlîfa.-
-Serokê Rêxistina Kongrêsa Cîhanî ya Emazîxî-Xalid El-Zêrarî.
-Şêwirmendê siyasî yê serokê Komara Qebîleyên Demokrasî û Pêşengê Tevgera diyarkirina çarenûsa qebîleyan MAK-Eksel Belebasî.
-Nivîskar û damezrînerê Rêxistina Ciwanan Îmohaj ya navdewletî-Aklî Şeka.
-Serokê berê yê Rêxistina Îmohaj ya navdewletî-Eyûb Ax Aşmed.
Cîgerê serokê Partiya Lîbiya El-Uma(Lîbo)- Ehmed Doga.-
-Nûnerê Amazîxên Nêcer di Rêxistina Kongrêsa Emazîxî ya cîhanî-Xelîlo Mihemed Hebîbo
-Nûnerê amazîxên Misrê di Rêxistina Kongrêsa Emazîxî ya cîhanî-Emanî El-Weşahî

Ji kar û xebatên ku me kirine heya niha ew ku em tevlî hemû çalakiyên kurdî yên taybetî doza têkoşer Abdullah Ocalan bûne.

**Nameya ku hûn ji gelê Kurd û civaka navdewletî re rê dikin di riya vê însyatîfê çi ye?**

Em dixwazin gelê Kurd hîs bikin ku birayên wan hene ku piştgiriya wan dikin, ku bi salan êş ji tevlîbûneke zordar û qirkirneke komî di nava çar dewletan de kişandin e, ji ber vê yekê ji erkê me ye weke Emazîxî bi gelê Kurd re hevgirtina xwe ava bikin û piştgiriya hev bikin, da ku em yek çarenûsê ji xwe re ava bikin.

**Çima hûn gelê Amazîxî û Kurd weke cêwî dihesibînin?**

Tevî ku gelê Emazîxî û Kurd ne di heman erdnîgariyê de ne û di dîrokê de hev nedîtine, lê belê ew bi heman şertûmercên dîrokî, civakî û siyasî derbasbûne, bi wateyeke din me heman tecrûbe bi hemû hûrgiliyên wê jiyan kiriye.

**Hûn helwesta civaka navdewletî ji domandina girtina Rêber Abdullah Ocalan çawa dinirxînin?**

Ji dema ku birêz Abdullah Ocalan hatiye girtin û kiryarên ne qanûnî û dijmirovî li ser têne meşandin, bi taybet di 4 salên dawî de tecrîdeke giran ji hêla desthilatdariya Tirkyê li ser hate ferzkirin, tişta ku mirov pê matmayî dibe ew e ku civaka navdewletî li hemberî vê yekê bêdengiyê nîşan dide, ev jî berjewendiyên bilind ên aliyên navdewletî nîşan dide. Di dema heyî de derfetê me kêm in ku em li Efrîqiyayê însyatîfê berfireh bikin, ji ber ku wekî tê zanîn doza me ya ku em ji bo wê kar dikin dema me dibe, lê em vê yekê li ser gelê Emazîxî hilbijêrin.

**Kesayeta Rêber Apo ji bo we çi nîşan dide?**

Birêz Abdullah Ocalan kilîta çareseriya Rojhilata Navîn e, doza kurdî çi di Tirkiyê de an li derve bêyî hebûna wî nayê çareserkirin, ji ber ku ramanê wî xizmeta jiyana hevbeş û azadiya jinê dike.. eger bê berdan û azadiya wî hate misogerkirin, em ê şandeyekê bi nûnertiya tevgera Emazîxî ava bikin, da ku pê re lêkolînên ji bo pêşerojê bikin.. bi şexsê xwe ez ê di nava şandeya ku pêşwaziya wî bikin de bim dema ku bê berdan.

# ‘Niha dora dewleta Tirk e ku gavan biavêje’

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

**Endamê Insiyatîfa Parêzerên Sûrî ya Parastina Rêber Abdullah Ocalan Xalid Omer diyar kir ku Rêber Apo gavên xwe avêtin, lê niha dora dewleta Tirk e ku gavan biavêje.**

Di 27’ê Şibatê de Rêber Apo banga xwe ya “Aştî û Civaka Demokratîk” raghand. Ev banga Rêber Apo dengvedaneke dîrokî çêkir, ne tenê gelê Kurd pê bandor bû, lê belê tevahî cîhan bi vê bangê bandor bûn. Rêber Apo hemû gavên ku divê bavêje, avêt lê tevî vê jî hîn tecrîd li ser Rêber Apo berdewam e û dewleta Tirk ji bo serxistina pêvajoyê tu gavên berbiçav navêtiye.
Di vê çarçoveyê de endamê Insiyatîva Parêzerên Sûrî ya Parastina Rêber Abdullah Ocelan Xalid Omer ji Rojnameya me re axivî.

**‘Niha pêwîst e dewleta Tirk gavan biavêje’**

Xalid Omer destnîşan kir ku Rêber Apo û Tevgerê Azadiyê erkê li ser milê xwe kirin û wiha got: “Tevî ku Rêber Apo pêşengiyê ji pêvajoya “Aştî û Civaka Demokaratîk” re dike, lê hîn tecrîd li ser berdewam e. Herwiha çi gavên ku ji Rêber Apo û Tevgerê Azadiyê duhatin xwestin hatin kirin. PKK’ê kongra xwe ya awarte lidarxist, biryara xwe ji nû ve avakirinê dan, têkoşîna çekdarî hat seknandin û meresîma şewitîna çekan hat lidarxistin. Edî hemû gavên pêşîn li ser dewleta Tirk e. Lê heya niha dewleta Tirk tu gavên ber bi çav neavêtine. Pêwîst e di destpêkê de bi awayekî lezgîn guhertinê di milê qanûnî de çêbike, da ku ji nû ve Rêber Apo bê darzandin, biryarek ji dadgehê derkeve û Rêber Apo sûdê ji mafê hêviyê bigire. Lê berovajî vê dewleta Tirk tu gavên cidî neavêtine. Eger gav ji aliyê dewleta Tirk di vê pêvajoyê de neyê avêtin û ev pêvajo were seknandin, wê şerê çekdarî ji nû ve were destpêkirin. Ev jî wê aloziyek mezin ava bike û ne ji berjeweniya herdu aliyan e.”


**‘Her kes xwesteka dîtina Rêber Apo dike’**

Omer diyar kir ku kampaniya “Ez dixwazim bi Abdullah Ocelan re hevdîtin bikim piştgiriya banga Rêber Apo ye û wiha domand: “Piştî ku banga Rêber Apo ya “Aştî û civaka Demokratîk” derket, her kes di wê baweriyê de ye û dewleta Tirk jî di wê baweriyê de ye ku mifta Aşîtiyê di gîştî Rojhilata Navîn de, di destê Rêber Apo de ye. Her kas dixwaze hevdîtinê bi Rêber Apo re bikin, ji bo ku armanc û helwesta xwe diyar bikin. Yek ji armanca wan hevdîtin e, ya din jî tecrîta ku li ser Rêber Apo dimeşe divê were seknandin. Dewleta Tirk tenê kesên ku ew dixwaze hevdîtinê, bi Rêber Apo re bike rê li pêşiya wan vedike. Em wek Insiyatîva Parêzerên Sûrî ya Parastina Rêber Abdullah Ocelan di 19’ê Tebaxê de me daxuyanî ji bo raya gîştî da, ku em jî tevlî vê kampanyê dibin û piştgiriya wê dikin. Daxwaza me ji bo rûspiyan, nivîskaran, endizyaran, memosteyên zanîngehan û rewşenbîran dikin ku tevlî vê kampamyê bibin da ku em daxwazê wan ji sekretêrê gîştî yê netewên yekbûyî, ji meclîsa Ewropa, wezîrê dadê yê dewleta Tirk re û ji hin saziyêm mafê mirovan re rêkin.”



**‘Serxistina vê pêvajoyê erkê her kesî ye’**

Endamê Insiyatîva Parêzerên Sûrî ya Parastina Rêber Abdullah Ocalan Xalid Omer axaftina xwe wiha qedand: “Rêber Apo bang li tevahî gelê cîhanê kir, ku xwe di serxistina vê pêvajoyê de erkdar bibînin. Ji zarokê 7 salî haya kalên 70’ê salî, endizyar, nivîskar, parêzer, memoste, ciwan, xwendekar, tevahî sazî û dezgeh divê helwesta û erkê ku dikeve ser milê wan di serkeftina vê pêvajoyê de bikin. Herwiah ya herî girîng pêwîst e, jin cihê xwe di serkeftina vê pêvajoyê de bigire, helwesta xwe diyar bike û erkê li ser milê xwe bike. çawa ku jinê serkêşî ji Şoreşa Rojava re kir divê serkêşiyê ji pêkanîna vê pêvajoyê re jî bike.”



## Li ser Rêya Nûreddîn Sofî

**Sînan Cûdî**

Qamişlo… Her kolanek toza berxwedanê hildigire, her kevir şopa biratiya gelan hildigire.
Ev bajar ne tenê ya Rojava lê ya hemû Kurdistanê bûye xala wijdanê. Ji ber ku her gavek li vir ne tenê çîrokeke herêmî ye, lê belê biryardariyek e ku bandorê li ser rêça dîrokê dike. Yek ji dengên ku ji van axan derket, dengê Nûreddîn Sofî bû. Ew deng îro jî di guhên ciwanan de deng vedide: “Berxwedan Jiyan e!”
Nûreddîn Sofî ji fermandarekî bêtir bû; ew sembola îradeyekê bû ku hebûna gel diparast, nasnameya wan diparast û pêşeroja wan ava dikir. Navê wî ne tenê li eniyên şer, lê di meclîsên gel, civînên gundan û akademiyên ciwanan de jî dihat bîranîn. Ji ber ku wî ne tenê di teorîyê de, lê di pratîkê de jî paradîgmaya Neteweya Demokratîk temsil kir. Bi îlankirina “Ciwanên Kurd tenê dikarin bi gelê xwe re azad bin”, wî xewnên takekesî yên rizgariyê bi armanca kolektîf a azadiyê re kir yek.
Îro, ciwanên Rojava mîrateya Nûreddîn Sofî hildigirin. Lê ev mîrat ne tenê li ser girtina çekan e. Ew tê wateya parastina rêveberiya xweser, parastina meclîsên gel, avakirina jiyana ekolojîk, pêşîniya azadiya jinan û parastina nirxên çandî ye. Neteweya Demokratîk ne tenê modelek rêveberiyê ye; ew veguherînek hişmendiyê ye. Heta ku ciwan hêza ajotinê ya vê veguherînê bin, gavên azadiyê dê qet li kolanên Qamîşloyê nesekinin.
Erê, dijmin mezin e. Artêş li ser sînor li bendê ne, dron li ezmanan digerin, hevkar hewl didin ku di nav xwe de nakokiyan biçînin…
Lê ciwanên Rojava vê dizanin: Parastina herî mezin yekîtî û helwesta rêxistinkirî ya gel e. Navê Nûreddîn Sofî sembola vê rêxistinê ye.
Jiyana wî ev yek fêrî me kir: Heya ku ciwanên gel dilsoz, bidîsîplîn û hişmendî tevbigerin, tu caran têk naçe.
Eger dilê Qamîşlo hîn jî lêdide, ev bi saya îradeya vî ciwanî ye. Dibe ku Nûreddîn Sofî bi laşî ne li gel me be, lê ruhê wî di her bêhna vê axê de heye. Û em ê wê bêhnê bibin sibêrojê jî.
Îro armanc eşkere ye: meşa li pêy doza Sofî û bi hezaran hevalên wî de avakirina Neteweya Demokratîk e. Li her tax, her dibistan, her zeviyê, her eniyê… Divê ciwan baweriya xwe bi hêza xwe bînin.
Dîrok ji me hêvî dike ku em ne tenê bi bîr bînin, lê di heman demê de wî û armancên wî bigirin ser xwe. Azadî ne mîratek e, ew berpirsiyariyek e. Werin em bi şopandina şopa Nûreddîn Sofî, pêşeroja Rojava bi hev re ava bikin, rûmeta Qamîşlo biparêzin. Ji ber ku em dizanin: Rêya me dirêj e, lê serkeftin a me ye.



# Çiya Kurd: Demokratîkbûna Sûriyê, bi vîna gelên Sûriyê pêkan e

Şêwirmendê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk Bedran Çiyakurd destwerdan û helwestên dewleta Tirk ya li hemberî Bakur û Rojhilatê Sûriyê rexne kir û wiha got: “Aliyekî aşitî û aliyekî din jî êrîş xizmeta çareseriyê nake.”

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Di derbarê pêvajoya ku li Sûriyê dimeşe, helwestên hikumeta Şamê û gefên dewleta Tirk li ser Sûriyê, Şêwirmendê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk Bedran Çiyakurd pirsên rojnameya me bersivandin û naveroka hevpeyvînê wiha bû:

**- Weke tê zanîn ji aliyê hikumeta Şamê ya veguhez ve amadekariya hibijartinan tê kirin û Rêveberiya Xweser daxuyanî da ku ev hilbijartin nûnertiya gelên Sûriyê nake. Ev daxuyanî tê çi watê û Hikumeta Şamê çima hebûna gelê Kurd napejirîne?**

Weke tê zanîn piştî hilweşandina rejîma Baas’ê, hikûmeteke nû ya bi piranî xwediyê hişmendî û ferasetekê olî ne, li Sûriyê hat li ser desthiladariyê. Ev hikumeta HTŞ’ê bi piştgiriya hêzên hegemon yên weke Tirkiyê gelek biryar û wesazîyên li gor berjewendiyên xwe li hikûmetê de bicih kirin. Yek jî wan sazûmankirina hilbijartinên parlemenê ye. Ev hilbijartin ne di dorhelekê demokratîk de pêk tê, ne jî nûnertiya vîna gelên Sûriyê dike. Ji ber ku pêkhateyên ku Sûriyê jiyan dikin di nav wan de cih nagirin û namzetê wan nîne. Ev hilbartin yek reng e û hin kesên hatine diyarkirin weke namzet hatin nîşandan. Ji bona amadekariyên ku ji hilbijartinan bê kirin, yek pêkhateyên ku di Sûriyê de cudaxweziyê dixwazin cih nagir in. Ev mijarakê rexnekirinê ye, em weke Rêveberiya Xweser wan rêbazên ku hilbijartin tên kirin napejirîn in. Hejmara ku ji bona parlementoyê 210 kes dikarin deng bidin ku ji bona serokê parlemento bê hilbijartin, lê hikûmeta veguhez tenê 70 nav dan xuyakirin ku ji bona serokê parlemento hilbijêrin. Yanî ev diyar e ku hez dikin ku yên bên hilbijartin hemû yek hişmendî û alîgirê wan bin. Ew naxwazin ku parlementoya bê avakirin, nûnertiya gelên Sûriyê tevahî bike. Ev pirsgirekeke bingehîn e û dibe asteng li pêşiya demokrasiya Sûriyê. Ew berdewamiya rejîma Baas’ê ya nîjadperest û olperest in. Yek jî bingeha ragihandina destura Sûriyê jî ne zagonî û mafnasî ye. Ji ber destûr jî, bi yekdest û hişmendî hatiye çêkirin. Ji ber ku di biryardayîna çêkirina zagonên Sûriyê yek cudaxwazên pêkhateyên Sûriyê ne amade bûn. Ger ku destûr bi rêbazên demokratîk hatibana çêkirin dê wê demê hilbijartin jî demokratîk biban. Rêveberiya Xweser ya demokratîk jî bi çi avahî tevlî hilbijartinan nebûye û encamên ku diqewimin jî ne berpirsyar in. Ji ber ku herêmên xweser rêjeyekê aliyê hejmarê de zêde welatî tê de dijîn û nûnertiya pêkhateyên tevahî Sûriyê dike. Niha hikumeta Şamê çi dike, bi yekdest û hişmendiyekê tengav kar dike. Ger hikûmeta Şamê xizmeta demokrasiya gelên Sûriyê û demokrasiyê neke xwe zêde li ser lingan nagire.



**- Hêzên cihadîst û tundrew gelek komkujî li herêmên weke Siwêda û perava Sûriyê pêk anîn û ev hemû bi agahiya hikumeta veguhez pêk hatin. Gelo rewşa Sûriyê ber bi ku ve diçe?**

Ev komkujî û qirkirina ku li herêmên weke Siwêda, Latkiyê, Deraa û hwd. hatin kirin, bi rastî jî pirsgrikên Sûriyê kûrtir kirin û di nav pêkhateyên din de metirseyeke mezin ava kir. Di heman demê de di nav welatiyên baweriyên cuda de jî, nakokiyan kûr dike. Pêwîstbû ku piştî rûxandina rejîma Baas’ê hemû pêkhateyên Sûriyê ji bona demokratikkirina welat kar bikin, lê berovajî wê alozî di demê hikumeta HTŞ’ê de kûrttir bûn. Ev fikarên li ser jiyana gelên Sûriyê zêdetir kirin. Ev kiryarên wisa jiyana hevpar ya di nav gelan de lawaz dike. Sedem û tawanbarên herî mezin jî hikumeta veguhez ya Şamê û çekdarên girêdayî wê ne. Ev jî dibe sedemekê bingehîn ku rewşa ewlehiyê aloztir bike. Ev kiryarên wisa Sûriyê ber bi dabeşkirinê ve dibe. Gelek welatên derve jî ev rastî dîtin û bi taybet piştî bûyerên ku li Siwêdayê qewimîn, desthiladariya heyî ne cihê baweriyê ye û hat teqezkirin ku desthiladariya veguhez êdî nikare ku ewlehiya Sûriyê pêk bîne. Di asta navnetewî de jî, hat tekezkirin ku li gel desthiladariyeke xwedî hişmendiyeke wisa lihevkirin ne pêkan e. Ji bona ku Sûriyê bikeve rewşeke bi ewle de, pêwîst e diyaloga Sûrî-Sûrî bê kirin. Pêwist e hikumeteke ku mafê tevahî Sûriyan bi parêze bê avakirin, tenê wisa li Sûriyê wê demokrasiyê pêk bê. Tenê bi nûnertiya gelên Sûriyê lihevkirineke hindirîn Sûriyê bibe welatekî bi ewle. Li ser vê bingehê di asta navnetewî de jî, wê piştgrî ji bona Sûriyê ava bibe. Tenê bi vî awayî wê bikare têkoşîna dijî terorê pêş bixîne. Pêwîst e ev komên çete û teror, yên cîhadîst rewşa wan bê zelalkirin û têkoşîn li hemberî wan bê meşandin û çekdarên biyanî bên derxistin. Yên ku destê wan di nav xwîna gelên Elewî û Durzî hene bên xûyakirin û di derheqê wan de doz bê vekirin.

**- Diyalog û danûstandinên di navbera Rêveberiya Xweser û Hikumeta veguhez de di kîjan astêde ne û çawa dimeşin?**

Em weke nûnerên herêmên xweser ji bona mafên gelên tevahî Sûriyê hevdîtinên xwe didomîn in. Lê danûstandin kêmekê tên qels û girankirin. Zû encam nayên girtin ev jî çend sedemên wê yên bingehîn hen e. Weke tê zanîn dê li paytexta Fransa Parîsê bi tevlîbûna hin serokwezîrên welatên derve jî, civînek li ser rewşa Sûriyê hatiba kirin, lê mixabin hikumeta veguhez ragihand ku ew tevlî nebe û civîn hat taloqkirin. Ji ber ku helwesteke wan ya ji bona lihevkirina ji bo pêşeroja Sûriyê zelal nîne. Hişmendiya wan tenê li ser radestgirtina QSD û saziyên Rêveberiya Xweser in, tenê wisa hez dikin hin hincetan pêş bixin. Ew jî ji aliyê rêveberiya me ve ti caran neyê pejirandin û ev ne çareserî ye. Ya di jî bandora Tirkiyê li ser helwesta hikumeta Sûriyê pir e. Em jî berovajî helwesta wan bi biryar in ku mijara goftûgo û danûstandinan pêş ve bibin. Di çarçoveya peymana 10’ê Adara 2025’an pêk bînin. Em nûnerê parastina deskeftiyên gelan in û em ê wan biparêzin. Lê heya niha lihevkirineke girîng derveyî mijara Helebê pêk nehatiye û em bi hêvî ne hikumeta Şamê bi vîna xwe tevbiger e û ji bona mafê gelên Sûriyê kar bimeşîne.

**- Dewleta Tirk bi her awayî dixwaze aloziya Sûriyê gurtir bike û bi taybet gefan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û QSD dikin. Hûn nêzikatî û gefên dewleta Tirk çawa digirin dest?**

Em gef û destwerdanên rayedarên Tirk li ser Sûriyê zêde di cih de nabînin. Taybet wezîrê kare derve yên hikumeta Tirk Hakan Fîdan weke wezîrekê hikûmeta Şamê tevdigere. Ev tê Şamê û Hesen Şeybanî jî diçe Enqerê her du cihan jî gefa li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwe. Ev ne rast e û mafê ti kesê nîne. Hakan Fîdan weke wezîrê Sûriyê tevdiger e. Daxûyaniyên wan hemû destwerdanê li karê Sûriyê yê hûndirîn dike. Ev bandorkirin ali ser biryarên gelên Sûriyê ne. Ev jî dibe sedem ku lihevkirin li Sûriyê çênebe. Piştgîrîkirina HTŞ’ê û êrîşkirina Tirkiyê li ser Rêveberiya Xweser dabeşkirina Sûriyê ye. Pêwîst e Tirkiyê rêbazên xwe biguher e û hevsengiyekê ava bike. Divê hikumeta Tirkiyê li gorî berjewendiyên tevahî Sûriyê tevbigere. Pêwîst e rêzê nîşanî welatên cîranê xwe bide. Pêwist e rola wê avaker be, ji ber ku weke stratejîk ew cîranê Sûriyê yeke girînge. Ji ber ku çi kiryarên neyinî û erenî rast e rast bandora xwe li ser Tirkiyê jî bike. Tirkiyê bi banga Rêber Ocalan binavê Banga Aşitî û Civaka Demokratîk pêvajoyekê nû daye destpêkirin û wan jî piştgrî daye wê pêvajoyê. Ev jî ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd erenî ye û em jî piştgrî dikin. Lê li kêlekê wê gefên wan li ser Kurdên Bakur û Rojhilatê Sûriyê astengîyekê mezin e û wê pêvajoyê jî bixetimîn e. Pêwîst e ev hewildanên ku ji bo pêvajoya çareseriyê li ji bona Kurdên Sûriyê jî bê nişandan. Ji ber ku tu welatekî xêrab bike, tê nikaribe welatên din ava bike. Doza Kurd li her çar beşê Kurdistanê hevdu bandor dike. Em bi hêvî ne, hikumet û rayedarên Tirk wisa nêz bibin.

FENER



## Îsraîl li dijî MÎT`a Tirk li Sûriyê ji nepeniyê derbasî êrişên rasterast dibe

**Idrîs Henan**

Daxuyaniyên piştî êrişa Îsraîlê ser hinek xal û bargehên başûr rojavayî Sûriyê derketine tekezî li rola xirab a Tirkiyê li Sûriyê kirin. Eşkere bû ku balefirên Îsraîlê li Sûriyê hinek xalên sîxûriyê yên Tirkiyê bombebaran kirine. Ji xwe tişta balkêş ne bombebaran e, lê belê eşkerekirina ne ji rêzê ya cewher û armancên van êrişan e.
Li qiraxa din jî bêdengiya Tirkiyê ya fermî û desthilata veguhêz a Sûriyê ku qaşo haya wê jê nîne, heye.
Bê goman ev yek ji tabloya giştî ya aloziya Sûriyê û hewldanên destwerdanê qut nîne. Her wiha diyar dibe ku hîna jî Sûriyê navendîbûna stratejîk a şerê wekaletê bi desthilatdariya nû ya HTŞ re wendanekiriye.
Berovajî, tekezî lê kiriye û aktorên nû lê zêde kiriye. Lew re piştî ku Tirkiyê hebûna xwe li Sûriyê bi gewde kir, dixwaze daqurtîne ku mîna pêvekekê dihesibîne. Yanê parçe bike û ji nû ve dîzayîn bike. Ev yek bi Rûsya û Îranê re ji salên 2016 heya 2024 kir.
Bi hilweşandina Baas re jî hewl dide her devera Sûriyê veguherîne bargeh û xalên MÎT`ê.
Nêzîkatiyên Tirkiyê bandor li dîplomasiya şer jî kiriye ku tiştên berê bi awayên sembolîk dihatin gotin û kirin, êdî yekser bûne. Ji ber vê jî Îsraîlê got ku navendên istixbarat Tirkiyê li Sûriyê bombebaran kiriye. Ew jî nameyek ji agir a pêşîlêgirtina ber bi çav bû ku “Haya me ji we heye. Hêza me jî têrê dike kîjan demê de be em we tune bikin”. Her wiha bi zorê pêfêmkirinek bû ku “Divê tu sînor û hedê xwe derbas nekî. Bi min re nekeve pêşbirkê, hêza navendî ya kakil li herêmê ez im”.
Derdê Îsraîlê heya radeyekê me fêm kir, lê gelo çima Tirkiyê bê deng maye? Tirkiyê aliyê fermî de hebûna xwe li Sûriyê her bi “Şerê li dijî terorê” û “Parastina ewlehiya neteweyî” îzah kiriye, êrişa Îsraîlê çîroka Tirkiyê vala derxist. Aliyek din ve hesabên wê yên stratejîk yên mezintir hene ku barê kirîza aborî rê nade rageşiyan bi dewletên rojavayî , DYE û Îsraîlê re derxîne. Lew re jî berê xwe daye bêdengiyê û xwe ji rûbirûkirineke rasterast diparêze. Hesabên wê yên siyasî li hundir jî rê nadin xwerakişandinek bi vî rengî. Derxistina rageşiyan dikare têkîliyên Tirkiyê - Îsraîl vegerîna xala sifrê, ev jî dê Enqerê ji hevkarekî sereke yê aborî û siyasî li herêmeke aloz, bêpar bihêle.
Di encamê de diyar bû ku hinek pîvan û rolên taktîkî yên nû li şerê herêmî zêde bûne. Yek jê ew e ku; çendîn berjewendiyên hevbeş navbera hêzan de hebin, tawîza hevrikiyê nayê dayîn. Ji bona wê jî çeka herî guncaw êrişa pêşlêgirtinê ya rasterast e. Ya din jî ew e ku; hemû aliyên ku serweriya Sûriyê bin pê dikin, bi rişdin ku qada Sûriyê ji hevrikiya xwe re vekirî bihêlin. Ev yek jî pêşeroja Sûriyê şîlo dihêle û rê li ber gelek tabloyên bi vî reng vekirî dimîne. Ango em ê demên pêş de rastî gelek êrişên eşkere yên rasterast werin. Eger li hev bikin jî, ihtîmal heye li paş perdeyan terazoya hêzê ji nû ve parve bikin û rewşa bêdengiya istîxbaratî dewam bike. Lê di hemû rewşan de heqîqet tal jî ew e ku; eger ne guhertinek demokratîk bi dilê hemû pêkhateyên Sûriyê be, wê Sûriyê bi desthilatdariya nû ya HTŞ re, di nav babelîska rageşiyên hêzan de ji hev bibe.